

BEYANNAMEYA HILBIJARTINÊ 2023-2026

**SANDVIKEN DIKARE
BAŞTIR BIBE!**

Di van salên dawî de li şaredariya Sandvikenê tiştên pir baş qewimîn. Berî her tiştî, karê lênihêrîna nexweşan li dema pandemîkê baş bi rê ve çû, bi rêjeya mirinê li bin % 2.3 li vê heyamê.

Îsal jî li Storvik'ê salona nû bo jîmnastîkê û salona hemî-çalakiyan hate avakirin.

Di serî de me divê em bi çand, spor, dibistan û xebatê hemî şaredariyê bi pêş bixin.

Em bi hev re baweriya bi paşerojê û ewlehiyê bo her kesî li şaredariyê ava dikin



**Sosyaldemokrat li
Sandviken'ê**



Sandviken - şaredariya pîşesazî û çandî ya nûjen

Li ser rûpelên jêrîn, em sosyaldemokratên li Sandviken'ê, bernameya xwe ya hilbijartinê ya bo heyama hikûmetê dewreya 2023-2026 pêşkêş dikin.

Sandviken şaredariyeka pîşesazî û çandî ya nûjen e. Tiştê ku li vir tê şirove kirin bê guman ne her tişt e ku em ê pê re bixebitin, lê ew wêneyekê dide me ku em rewşa heyî û pêwîstiyên pêşerojê bi gelemperî çawa dibînin.

Civakeke sosyal demokratîk helbet dikare li herêma bê avakirin, lê bo polîtîkayeke xurt a sosyaldemokratîk jî pêwîstî bi rêveberiyêke sosyal demokratîk a neteweyî û herêma heye. Bi kêmanî me ev li dema pandemiyê dît, ku hevrêzî û organîzekirina astên cihêreng ên ber bi armanca hevbeş pir girîng bû.

Em sosyaldemokrat, nexweşan li hevber kesên saxlem, extiyaran li hevber ciwanan, mêran li hevber jinan, bajarên li hevber welat û yên xwedîkar li hevber kesên ku karê xwe ji dest dane, nadin.

Sandviken a me civakeke vekirî ye ku pirçandî ye, demokratîk e, yeksan û wekhev e.

Sosyaldemokratên li Sandviken'ê dê bixebitin da ku;

- Divê Sandviken bibe şaredariyêke ewle ku tê de bê jiyîn
- Divê her kesê têde, xwedî derfeta kar be
- Divê dibistan perwerdeyêke baş bide her kesî, alîkarî bo perwerdehiya civakî bide û pêwîstiyên ferdî yên xwendekaran bi cih bîne
- Divê em xwedî refahiyeke hevpar a xurt a bê armanca qezencê bin
- Divê her kes bo berhemdêriyê xwedan derfetên baş be û bikaribe ji derfetên spor û çandê sûd werbigire.
- Divê mîratên avahî û çandî ya me ya behevpa were parastin û pêşxistin

Dengê we biryardêr e.

Li roja hilbijartinê, li 11ê îlonê çavê me li bendî dengên we ye!

Şaredariya ku mezin dibe

- Hemî şaredarî dê ji bo pêşerojê bi hêztir were avakirin
- Bi kêmanî 500 xaniyên nû
- Jîngeh û cîhên civînê yên domdar

Kar û firehbûn bo baweriya pêşerojê

- Ji bo şaredariyê 1000 karên nû
- Di çarçoveya xebatên şaredariyê de salê herî kêr 400 ciyên staj û pratîkê
- Bo firmayan derfetên hêsan ên pargîdan û pêşveçûnan
- Dema peymanên avahiyan dibin, şaredarî cî bo şagirdan bixwaze
- Bi hevkarîya berfireh, em zanetî û fêrbûna riya xwe debarkirinê ya demdirêj teşwîq dikin

Zanyarî Sandviken'ê xurtir dike

- Divê hemî xwendegên ku îro xwendekar lê hene bimînin
- Divê mafê zarokan ê xebatên perwerdehiyê yên li pêşdibistanê bê berfirehkirin
- Divê dibistan hemî pêwîstiyên taybetî yên zarokan bi cîh bîne da ku şert û mercên herî çêtir ên bo wergirtina dîplomaya lîseyê bo her kesî hebe
- Çavkaniyên dijîtal beşeke xwezayî ya fêrbûnê ne.
- Dibistana seretayî divê bikaribe taştê bide bo xwendekaran

Sexbêrî û lênerîneka baş li seranserê şaredariyê

- Divê em kontrola demokratîkî ya refahê biparêzin
- Bi kêmanî 100 cihên nû yên malên lênerînê
- Serxwebûn û azadîya mezintir bo wergirên lênerînê
- Teknolojiya nû bo berjewendîya kesên li bin lênerînê û karkeran

Ewlekarî li cîhaneke guherber

- Divê hemî şaredarî bibe cihekî ewle û balkêş bo lêmayînê, jiyanê û xebatê
- Bo xurtkirina nirxên demokratîkî divê em li derveyî sînorên çînan bikaribin werin nik hev
- Divê em li dijî cudakariyê rawestin û taxên ku ji hêla civakî-aborî li paş mane, bilind bikin

Çand, xweza û spor

- Li şaredariyê, li zêdetir cihan dê Fritidsbanken (banka demên vala) were avakirin
- Herêmen xwezayê yên şaredariyê ava bikin
- Piştgirîdan bo pêşveçûna tûrîzm û tecrubeyên xwezayê
- Şaxên pirtûkxaneyê dê bêne pêşxistin



Dengê xwe bide Sosyaldemokratan!



Hûn dikarin ji 24ê Tebaxê heta 11ê Îlonê zû deng bidin

Karta nasnameya xwe û karta dengdanê ya ku bi riya qutiya posteyê hatiye malê di gel xwe bînin.

Malper: sapsandviken.se

Facebook: facebook.com/s.sandviken

Instagram: instagram.com/s.sandviken

Twitter: twitter.com/ssandviken